Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :837 10-Sibat- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li Til Mişhenê kelecana maçê



**Darîn Silê/Qamişlo**

Bi piştgiriya Yekîtiya Werzişê ya Herêma Cizîrê û rojnameya Ronahî, 7ê vê mehê saet 12an, li stada gundê Til Mişhen yê navçeya Til Koçer, merasima vekirina pêşbirka maça futbolê hat lidarxistin.

Ji bo bîranîna şehîdan û dilsoziya gelê Til Mişhen, merasimê bi deqeyeke rêzigirtinê dest pê kir. Di merasimê de ji hêla helbestvan Sebah El Hemdan ve helbestek hat xwendin û tê de spasiya kesên werzişvan kir.

**"EM BI VÊ GAVÊ KÊFXWEŞ IN"**

Derbarê mijarê de ji rêveberiya rojnameya Ronahî Dijwar Ehmed Axa wiha axivî: "Ji ber organîzkirina vê lîstika



binavûdeng, em spasiya şêniyên Til Mişhen dikin. Em bi hêvî ne ku tîmên beşdar tev werzişeke rêzgirtî û baş pêşkêş bikin. Em bi vê gavê kêfxweş in û serkeftinê ji beşdaran tevan re dixwazin."

Piştî bidawîkirina merasimê, pêşbirka futbolê di navbera tîma Til Mişhen û ya El Muqrenat de dest pê kir. Di pêşbirkê de Tîma Til Mişhen gola yekê avêt. Berî bidawîkirina pêşbirkê Til Mişhen gola duduyan bi lingê werzişvan Hûsên avêt. Angu ev lîstika futbolê Tîma Til Mişhen du gol, ya El Muqrenat sifir bi davî bû.

## Li Dêrezorê perwerdeya mamosteyan





Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Dêrezorê li bajarokê Kesra dewreyeke perwerdeyê ya mamosteyan bi dawî kir.

Bi armanca bilindkirina asta mamosteyan, Komeleya Perwerdeyê ya bajarokê Kesra ya Dêrezorê dewreyeke perwerdekirina mamosteyan vekir. Perwerdeya ji aliyê kadroyên pispor ve hatî dayîn 6 rojan dewam kir û roja Şemiyê bi dawî bû.

Têkildarî mijarê, mamoste Ferhan El-Hemûd diyar kir ku ji destpêka sala 2014'an heta 2017'an ji ber sûcên DAIŞ'ê qada perwerdeyê li Dêrezorê paş ve çû.

El-Hemûd got, piştî rizgarkirina bajarok guhartinên mezin çêbûn û piranî mamosteyan xwediyên berwernameyên amedeyî, çandinî û pîşesaziyê ne.

103 mamoste girêdayî Komeleya Perwerdeyê ya bajarokê Kesra ne, li 64 dibistanan perwerde didin. Herwiha hejmara giştî ya xwendekarên li bajarok 33 hezar û 400 xwendekar in.

# Careke din birînên gundê Koço vedibin





**Darîn Silê/Qamişlo**

Sisiyê Tebaxa 2014an çeteyên DAIŞ`ê bi awayekî hovane êrîşî Şingalê kirin û li gundê Koço komkojiyek pêk anîn. Di komkujiyê de bi sedan Êzîdî kuştin û bi hezaran jî revandin. Wê demê çeteyan cenazeyên kesên kuştîn di gorên komî de veşartin. Piştî şeş salan, li gundê Koço di gorên komî de cenazeyên 407 Êzîdiyan hatin dîtin û nasnameyên wan diyar bûn.

Ji bo 104 qurbanên komkojiya gundê Koço, Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê û Mala Êzîdiyan ya Herêma Cizîrê 6ê vê mehê li gundê Xirbet Xezal yê bajarê Dirbêsiyê merasimek li dar xistin.

Di merasimê de endamên Tevgera Civaka Demokratîk, Êzîdiyên herêmê, rûspiyên eşîrên Êzîdiyan û endamên Partiya Yekîtiya Demokraîk, amade bûn.

**GELO ŞÊNIYÊN GUNDÊ KOÇO ÇI SÛC KIRIBÛN?**

Di merasimê de hevserokê Mala Êzîdiyan Farûq Tozo, wiha axivî: "Çeteyan bi awayekî hovane êrîşî gundê Koço kir û bi sedan gelê wê kuştin û piraniya jinan revandin. Di rizgarkirina gelê Şingalê de, şervanên YPG û YPJ`ê xwedîrolekî mezin in. Şingal ne tenê ye, tevgera azadiyê li piştê ye.

Derbarê mijarê de endamê rêverberiya Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) ji malbatên şehîdên komkojiya Koço re sersaxî xwest û got, dewleta tirkî bi navê DAIŞ`ê û bi êrişên ser Şingalê, xwest dîroka gelê Kurd tine bike û îradeya wî bişkîne. Dewleta tirkî, Iraq û PDK li ser Şingalê planeke nû amade dikin û dixwazin gelê Êzîdî tine bikin.

### Quncika têgînan.


| | |
|---|---|
| **Hêman** | **Bingeh, hîm, xîm, esas. Bernameya xwe li ser hêmaneke xurt çêkiriye.** |
| **Koalisyon** (Fransî) | Yekîtiya ji çend hêzan pêk tê, rêveberiya hevbeş: Welat bi koalisyonê tê birêvebirin. Itîlaf. |
| **Restore** (Fransî) | Çêkirina deverên xerabûyî yên avayiyekê, Nûkirin: Keleha Elodîno hat restorekirin. |
| **Rêgez.** | Fikirê bingehî, baweriya bingehî. Prensîb, mebde: Rêxistineke xwedîrêgez e. Mirovekî xwedîrêgez e. |
| **Stad/Stadyom** (Fransî) | Ciyê lîstina taximan, ciyê pêşbirka lîstikên sporê, ciyê merasiman. Qad, sahe. Du taximên futbolê li stadyoma Qamişlo hatin hemberî hev. |
| **Tîm** (Ingilîzî) | Yekîneyeke futbolê û lîstikên din. Du tîmên futbolê hatin hemberî hev. Ferîq. |
| **Turnuva** (Fransî) | Rêzepêşbirkên bi dorê di navbera tîmên sporê de tên lidrxistin. Mûsabeqe. |
| **Tûnel** (Fransî) | Riya di bin erdê de, riya harîrdorê wê girtî. Ji bo kurtkirina rê di çiyê de tûnelek hat vekirin. |
| **Werziş** | Spor. |
| **Werzişvan** | Kesê sporê dike. |

## Cenazeyên 104 qurbanên komkujiya Koço hatin veşartin

***Cenazeyên*** 104 welatiyên Êzîdî yên qurbanên komkujiya Koço ku ji gorên komî yên Şingalê hatibûn derxistin, bi merasimeke olî hatin veşartin. ***R-2***



## Norman Paech: Divê Ocalan demildest bê berdan



***Prof. Norman Peach*** diyar kir ku tecrîdkirina 22 salan pêkanîneke zalimane û dermirovî ye. Rêber Abdullah Ocalan dikare di mûzakereya konsepta aştiyê de bibe kesê bingehî û got, divê demildest were berdan. ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 837 10-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Koordînasyona Jinan bû beşek ji sazûmaniya Rêveberiya Xweser



Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser di civîna xwe ya asayî de Koordînasyona Jinan beşek ji sazûmaniya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê pejirand. ***R-3***

# Hevdîtinên we bûn xwîna Siyahoş

PYNK û ENKS amadekariya destpêkirina gera sisiyan ya danûstandinan yên bi navcîtiya Emerîka dikin. Ji bo çareserkirina nakokiyan, nêzî salekê ye di navbera PYNK-ENKS'ê de hevdîtin çêdibin. Digel ku tê gotin, di gelek mijaran de li hev kirine, lê hê çend mijarên sereke li benda çareseriyê ne. Ji ber ku hevdîtinan pir dirêj kir gel bertekên xwe diyar dike. *R-2*

Partiyên Yekîtiya Niştimanî ya Kurd
أحزاب الوحدة الوطنية الكردية


ENKS 26-10-2011

## 74 akademîsyen tevlî kampanya 'Ji Ocalan re Azadî' bûn




***74 profesor*** û doçentên ji Fakulteya Zanyarên Civakî û Siyasî ya Zanîngeha Calabrîa ya Îtalya û ji senatoya akademîk piştgirî dan kampanya ji bo azadiya fîzîkî ya rêber Abdullah Ocalan. ***R-4***

## Deriyê Sêmalka careke din vebû



***Rêveberiya*** deriyê sînor yê Sêmalka ragihand ku ji roja Duşemê ve derî careke din vebûye. ***R-5***

## Desteya Kar û Barê Civakî desteka koçberan didomîne



***Hevserokê*** Desteya Kar û Barê Civakî Farûq El-Maşî diyar kir ku xebata desteyê ji bo desteka koçberan didome û got, emê îsal xebata xwe zêdetir bikin. ***R-6***

# Cenazeyê şehîd Şakir li Qamişlo hat veşartin

**Şêniyên bajarê Qamişlo cenazeyê endamê Hêzên Ewlekariya Hundir Serdar Şakir li goristana şehîd Delîl Saroxan spartin axê.**



Şehîd Serdar Şakir 5`ê Sibatê di encama krîza dil de li bajarê Qamişo şehîd bû. Bi sedan şêniyên Qamişlo beşdarî merasima veşartinê bûn.

Di merasima li goristanê de endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Mihyedîn Hesen sersaxî ji malbata şehîd re xwest û diyar kir ku hêzên Ewlekariya Hundir berpirsyariya parastina xakê û gel girtine ser xwe.

Hesen banga parastina destkefityên bi keda şehîdan hatîn bidestxistin û piştgiriya hêzên parastinê kir.

Dûv re endamê rêveber ê Hêzên Ewlekariya Hundir ya bajarê Qamişlo Şiyar Mihemed axivî û got, emê rê nedin ku komplo û planên li dijî Rojava û gelên wê ku destkeftiyên bi saya 11 hezar şehîd hatine bidestxistin, bi ser bikevin û emê bi ser bikevin.

Şiyar Mihemed di dawiya axaftina xwe diyar kir ku wê şopdarên riya şehîdan û fikirê rêber Abdullah Ocalan bin.

Cenazeyê şehîd di nava sloganan de li goristana şehîd Delîl Saroxan hat veşartin.

# Cenazeyên 104 qurbanên komkujiya Koço hatin veşartin



Cenazeyên 104 welatiyên Êzîdî yên qurbanên komkujiya Koço ku ji gorên komî yên Şingalê hatibûn derxistin, bi merasimeke olî hatin veşartin.

Tîmên hikumetê û tîmên navneteweyî yên pispor di çarçoveya lêgerînê li gorên komî de, 18 gorên komî yên şêniyên gundê Koço yê Şingalê dîtin, ku di fermana 15'ê Tebaxa 2014'an de ya li ser Şingalê hatibûn kuştin.

Piştî ku nasnameyên wan 104 qurbanan hatin naskirin, merasimeke olî taybet ji bo Êzîdiyan li gundê Koço hat lidarxistin. Di merasImê de şervanên Yekîneyên Berxwedana ŞIngalê, Yekîneyên Jinên Şingalê, nûnerên Meclisa Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ya Şingalê, Partiya Azadiya Demokratîk ya Êzîdiyan, Tevgera Jinên Êzîdî û nûnerên saziyên sîvîl, herwiha bi hezaran şêniyên herêma Şingal û rayedarên Iraqê, amade bûn.

Cenazeyên qurbanan li goristaneke taybet li goristana qurbanên Koço hatin veşartin.

Hêjayî gotinê ye ku zêdeyî 900 kesî ji gundê Koço ji hêla DAIŞ'ê ve hatin revandin. Heta niha 663 kes hatine rizgarkirin û 140 kes jî çarenûsa wan ne diyar e, di nava wan de 90 kes jinên Êzîdî ne.

# Rêveberiya demî ya Libya hat hilbijartin



Di komxebata diyalogên libyayî de, Mihemed El-Menfî bû serokê meclisa serokatiyê, Ebdulhemîd serokê hikumeta nû ya El-Wehda û Mûsa El-Kobanî û Ebdullah El-Lafî bûn endamên meclisa serokatiyê.

Nûnera NY ya taybet ji bo Libya ya erkdarkirî Stephanie Williams, ev kêlî bi kêliyeke dîrokî bi nav kir û got, kêfxweş im ku ez dibim şahida vê kêliya dîrokî.

Stephanie Williams xîtabî aliyên Libyayê kir û got, we gaveke mezin avêt û we nakokî derbas kir, ev jî xizmeta gelê Libya û welat dike. Herwiha bang li desthilata rêveber ya nû kir ku girêdayî erkê xwe be.

Nûnera NY ya taybet ji bo Libya diyar kir ku divê serokwezîrê erkdarkirî di nava 21 rojî de bernameya karê wê pêşkêş bike.

# QSD`ê li navçeya Deşîşa tûneleke çeteyên DAIŞ`ê dît



Di çarçoveya operasyona berfireh ya QSD`ê ya ji bo tolhildana şehîd Seida û şehîd Hindê de, şervanan li navçeya Deşîşa tûneleke çeteyên DAIŞ`ê dît.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê roja Înê bi daxuyaniyekê ragihandibû ku bi beşdariya Yekîneyên Parastina Gel (YPG), Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) û Hêzên Ewlekariya Hundir, li herêma Dêrezorê û heta sînorê Iraq-Sûriyê, li dijî çeteyên DAIŞ`ê operasyoneke berfireh dest pê kirine.

Li gorî Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê, di operasyonê de heta niha bi dehan şaneyên çeteyên DAIŞ`ê li herêmê hatine girtin. Herwiha di çarçoveya çalakiyên lêgerînê de li navçeya Deşîşa tûneleke girêdayî çeteyên DAIŞ`ê hat dîtin.

# Hevdîtinên PYNK û ENKS'ê dest pê dikin

Piştî ku hat ragihandin ku wê di vê hefteyê de danûstandinên di navbera PYNK-ENKS'ê de ji nû ve dest pê bikin, hat zanîn ku wê mijara Rêveberiya Xweser û dosya leşkerî werin nîqaşkirin.

PYNK û ENKS amadekariya destpêkirina gera sisiyan ya danûstandinan yên bi navcîtiya Emerîka û insiyatîfa fermandarê QSD`ê Mezlûm Ebdê sala 2019`an ragihandî, dikin.

Di vê çarçoveyê de, fermandarê giştî yê QSD`ê Mezlûm Ebdê 31`ê Çile, li ser Twitterê nivîsand û got: "Armanca me biserxistina danûstandinên di navbera ENKS û PYNK`ê de ye. Erkê her kesî ye ku amadekariya pêvajoya yekîtiyê bike, da ku em di rojên pêş de dest bi pêvajoyeke nû bikin."

Li gorî rayedarên her du aliyan, tê payîn ku ev pêvajoya ku vê hefteyê were destpêkirin, pêvajoyeke dijwar be. Lewre hin nuqteyên ku di pêvajoya duduyan de lihevkirin li ser çênebûye û taloqî pêvajoya sisiyan bûne ango mekanîzmaya nûnertiya ENKS`ê di Rêveberiya Xweser de û mijara çekdarên PDKê yên navê "Pêşmergeyên Roj' li xwe kirîn, mijarên girîng yên van hevdîtinan bin.

Li gorî endama danûstandinan ya di nava şandeya PYNK`ê de Sema Bekdaş, tê payîn ku pêvajoya sisiyan ya diyalogên di navbera PYNK û ENKS'ê de, piştî ku nûnerên Wezareta Karê Derve ya Emerîka bigihin bakur û rojhilatê Sûriyê û bi her du aliyan re bi awayekî cuda bicivin, were destpêkirin.

Sema da zanîn ku mijarên di pêvajoya sisiyan de werin nîqaşkirin derbarê nûnertiya ENKS`ê di nava Rêveberiya Xweser de û dosyaya leşkerî ye.

Sema wiha got: "Emê mijara yekê ango nûnertiya ENKS`ê di Rêveberiya Xweser de nîqaş bikin, lê derbarê mijara leşkerî û derbasbûna çekdaran de, em PYNK vê mijarê dihêlin ji QSD û ENKS`ê re."

Danûstandina di navbera PYNK û ENKS'ê de sala 2019`an dest pê kir. Gera duduyan ya danûstandinan Mijdara 2020`an ji ber hilbijartinên Amerîka hatibû rawestandin.

***Çavkanî: ANHA***

# Şêniyên Minbicê kuştina 3 ciwanan ji aliyê hêzên hikumeta Şamê ve şermezar kirin

Şêniyên bajarokê Til Hozan yê başûrê bajarê Minbicê kuştina 3 ciwanên bajarok ji aliyê hêzên hikumeta Şamê ve bi çalakiyekê şermezar kirin.

Li gorî şêniyên bajarokê Til Hozan, berî çend rojan 3 ciwan dema li ber Firatê masî digirtin, ji aliyê hêzên hikumeta Şamê ve yên li Çiyayê Erwada hatin kuştin.

Şêniyên bajarok kuştina her sê ciwanan bi çalakiyekê şermezar kirin. Bi navê welatiyan, Hevserokê



Meclisa Til Hozan Ehmed El-Hisên axivî û got, em di şînê de ne, wê dîrok heta sedên salan van rojên bieş bîr bîne. Me 3 ciwanên ku ji bo debara malbata xwe dixebitîn wenda kirin, ew şehîdên rastî ne.



# Desteya Ciwanan û Werzişê ji bo pêşxistina behreya ciwanan xebata xwe zêde dike

**Hevseroka Desteya Ciwan û Werzişê behsa projeyên sala 2020î de pêk anîn kir û diyar kir ku hewl didin sala nû de kovarekê ji bo werzişê derxin û kampên havînê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê ava bikin, herwiha gelek çalakiyên werzişê li dar bixin.**



Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê girîngiyeke mezin dide ciwanan. Desteya Ciwanan û Werzişê girîngiyê dide warên perwerdekirina ciwanan û pêşxistina behreyên wan. Di wê çarçoveyê de gelek çalakiyên werzişê yên cuda li dar dixe.

Di civîna salane ya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser de ku 18`ê Çile li avayiya Rêveberiya Xweser ya li Reqayê li dar ket, behsa çalakiyên desteyê li ser gelek astan li herêmê li dar xistîn, hat kirin. Di dawiya civînê de, destpêkirina projeyên geşepêdana ciwanan û aktîflkirina çalakiyên werzişî li herêmê hat ragihandin.

Li ser mijarê hevseroka Desteya Ciwanan û Werzişê ya Rêveberiya Xweser Meha Mihemed projeyên herî girîng yên sala borî pêk anîn û astengiyên derketîn bîr xistin. Meha diyar kir ku ji ber pandemiya koronayê li tevayiya herêman gelek çalakiyên werzişê û gelek projeyên avakirinê rawestiyan.

Desteya Ciwanan û Werzişê 2020`an hewl da gelek avayiyên werzişê restore bike û 18 stadên futbolê li herêmên Cizîr û Firatê û herêmên Reqa û Tebqa ava kirin. Ji bo pêşxistina ciwanan di warê werzişê de, desteyê 10 holên werzişê amade kirin, jê 3 li herêma Tebqa, 6 li bajarê Reqa û holek li herêma Cizîrê ne.

Desteya Ciwanan û Werzişê, derbarê hişyarkirin û zanakirina ciwanan de li ser madeyên hişbir û zewicandina bi temenê biçûk, gelek semîner û civîn li ser astên bakur û rojhilatê Sûriyê li dar xistin.

## KOMPEKE HAVÎNÊ Û KOVAREKE WERZIŞÊ, PROJEYÊN SALA 2021`AN IN

Meha Mihemed xebat û projeyên ku wê sala nû de pêk werin eşkere kirin: "Gelek proje hene ku emê îsal pêk bînin ku wê di pêşxistina tevayiya çalakiyên ciwanan de rolê bilîzin."

Meha wiha pê de çû: "Emê hewl bidin werşeyeke dirûnê ya cilên werzişê li Reqayê ava bikin, turnuvayên tevayiya lîstokên yekkesî û komî li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê li dar bixin."

Meha da zanîn ku wê yekîtiyeke giştî ya werzişê ava bikin, qanûnên ji bo ruxsetkirina klûbên werzişê û birêxistkirina karê werzşê derxin. Herwiha Meha Mihemed diyar kir ku îsal wê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê kovareke girêdyaî tevayiya çalakiyên ciwanan yên li herêmê derxin û wiha pê de çû: "Emê navendên geşedanê û zanakirina ciwanan li tevayiya herêman ava bikin. Îsal wê mihrîcanên werzişê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê werin lidarxistin mîna mihrîcana şehîd Stêrvan, Mihrîcana Werzişê ya Salane ku li herêmê li dar dikeve."

Hevseroka Desteya Ciwanan û Werzişê ya Rêveberiya Xweser Meha Mihemed di dawiyê de da xuyakirin ku wê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê kampên havînê ji bo ciwanan ava bikin û ji bo zanakirina ciwanan û pêşxistina behreyên wan, wê asta xebata xwe xurttir bikin.

# Kewser û Zehra bi wênexêziyê rewşa jinan rave dikin

Şêwekar Kewser El-Xelef û Zehra El-Bedawî bi tabloyên xwe zehmetiyên jinan didin der. Bi taybet jî jinên li bajar û herêmên dagîrkirî.

Kewser El-Xelef xwest behreya xwe ya wênexêziyê di dema şerê li Reqa de di hundirê xwe de veşartî zindî dike. Kewserê ji ber zehmetiyên dîtîn nikarîbû karê xwe li malê berdewam bike û li bendê bû ku hin piştgiriya wê bikin. Ji ber wê bi vekirina Navenda Çandê ya bajarê Reqayê destek jê re hat dayîn ku vê behreyê pêş bixe.

Kewser El-Xelef ya ji bajarê Reqayê sala 2008`an Peymangeha Hunera Şêwekariyê qedandiye. Kewser li ser heskirina wênexêziyê mezin bû û li Navenda Çandê ya Meclisa Sîvîl ya Reqayê dest bi behreya xwe kir. Navendê pêwîstiyên sereke yên madeyên wênexêziyê jê re pêşkêş kirin. Lewre nirxê madeyan pir bilind e.

## BEHREYA ME YA HÛNERÊ BI AZARÊN JINAN VE GIRÊDAYÎ YE

Şêwekar Kewser El-Xelef ji navenda Çandê ya Reqayê got, min ji behreya xwe hes kir û bi tabloyên xwe rastiyê rave dikim. Ji ber wê ez bi hunera xwe rewşa jinên Reqayê û azarên ku kişandine derdixim holê.

Kewser derbarê hilbijartina vî şêwazê wênexêziyê de axivî û wha got: "Wênexêzkirin ne tiştekî hêsan e, lê yek ji sedemên ku hişt em rastiya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ku bû sedema koçberkirina gelê me yê li bakur û rojhilatê Sûriyê xêz bikin, ew bû ku me ew rastî bi çavê xwe dît."

## DETAYÊN JIYANA JINAN ÎFADE DIKE

Kewserê behsa hevala xwe Zehra El-Bedawî ya ku li navenda Çandê pê re dibe alîkar kir û got, bi rastî jî xwedî behreyeke dewlemend e. lê dema behsa behreya wê tê kirin, şerm dike, ji ber ji ku ker û lal e.

Kewser di berdewamiya axaftina xwe ya têkildarî Zehra de wiha got: "Zehra xwedî vîneke xurt e û gelek caran di tabloyên xwe de felsefeya jinên rewşenbîr, jêhatî û xwezayî nîşan dide, ji ber ku jin û xweza bi hev e girêdayî ne."

Kewser û Zehra du hevalên pir nêzîkî hev in, ji ber ku li heman deverê ne û xwedî heman behreyê ne. Kewser bi zimanê îşaretan ji Zehra fêm dike, nêrîna wê di her tabloyeke ku dixwaze xêz bike de digire.




Kewser li ser zimanê hevala xwe Zehra ku bi zimanê îşaretan pê re axivî, da zanîn ku divê jinên astengdar, astengdariya xwe ji xwe re nekin kelem û bi vîneke xurt behreyên xwe berdewam bikin.

Zehra ji Kewser re bi rêya îşaretan got: " Em dixwazin bi rêya tabloyên xwe beşek ji zehmetiyên ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di demên êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê de kişandine nîşan bidin."


## TABLOYÊN ME AZARA GELÊN ME YÊN LI HERÊMÊN DAGIRKIRÎ NÎŞAN DIDIN

Tabloyên her du şêwekaran îşaretê bi şer û azarên ku herêm tê re derbas bûye dikin. Her wiha asta êş û jana ku artêşa Tirk a dagirker li herêmên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî û heta êrişa dawî ya li dijî Eyn Îsayê pêk anîye didin der.

Li aliyekî din jî Kewser û Zehra bi rêya tabloyên xwe şewitandina malên Efrînê û koçberirina şêniyên wê a ji aliyê artêşa Tirk a dagirker ve û berxwedana jinan didin der.

Zehra û Kewser zêdetirî 50 tabloyî xêz kirine û beşdarî gelek pêşangehên li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê li (Tebqa, Qamişlo, Rimêlan û Minbicê) hatine lidarxistin, bûne.

## Qeyd û Bendên Xwe Bişkînin



Sîpan Şînda

Gelo azadî ji kû destpê dike? Azadiya takekesî û tixûbên wê çawe teng dibin yan jî ji halê radibin? Mirov çima tixûbên azadiya xwe teng dikin? Yan ji gelo çire tixûbên azadiya mirovî di zarokatiyê de ji dema mirov mezin dibe firehtir in? Rast e, pergal, civak û derdor gelek bandorê li ser jiyana mirovî dike, lê belê pitirê xwe kes bi xwe qeyd û bendan li mejî, giyan, hizir û azadiya xwe dide û wan dorpêç dike. Ew qeyd û bendên ewqasî stûr li azadiya xwe didin, êdî ew qeyd û bend di nava demê de vediguherin taqên kelehan û êdî bi gurz û keranan ji mirov nikare wan taqan bişkîne. Her seht û gavên xwe werdigerînin zîndanê. Welê li mejî û giyanê xwe dikin, êdî ew nikarin bi awayekî cuda bi fikirin, tiştekî bi afirînin, yan ji bêjin. Ev ji tê wê wateyê ku gellek kes bi xwe zîndana xwe ava dikin, ew bi xwe hostayên taq û dîwarên zîndana xwe nin, qerdiyan û zêrevanên zîndana wan ji ew bi xwe nin. Zêrevanî û qerdiyaniyê ji hizirên xwe re dikin. Çi kesê hayî ji wan ji nîne ku ewan xwe êxistiye di nava wê zîndana reş û tarî de. Lê çi bikin rebena jiyan li xwe teng kirine, dunya li ber çavê xwe reş kirine, azadî ji giyan, mejî û jiyana xwe avêtine. Qeyd û bendên azadî kuj, hizir qelîn, giyan tarîker, mejî reşker. Qeyd û bendên ne ji hesinî, lê ji yên hesinî hişktir ji xwe re çêkirine û xwe kirine di nava wan de.

Gelo çima em vê li xwe dikin? Çima em dunyayê ji xwe re dikin zîndan û xwe têxin tê de? Çire em jiyanê hinde li xwe teng dikin û wê li ber çavên xwe reş dikin? Ma me çi ji "xwe" kiriye ku heta em vî cizayî didin xwe? Ez bawerim gelek kesan hayî jê nîne ku ka me hizir, giyan û mejiyê xwe êxistiye di çi halî de. Divê mirov azadîxwaz be, lê belê divê mirov di serî de azadiyê di giyan , mejî û hizrên xwe de ava bike. Divê mirov avdên azadiyê di giyanê xwe de vehûne, di mejiyê xwe de verêse û di hizrên xwe de rayêxe. Giyanê azadîxwaz nikare çi qeydan qebûl bike. Ew hizrên di mejiyên azadîxwaz de fitlan didin xwe û hecama wan nayê, divê weke tov li zeviyan bêne reşandin. Ew ramanên di mejiyên azadîxwaz de şîn dibin, divê di nava lat û zinaran de penc bidin, rayên xwe stûr bikin, şitlên nû bidin. Çawa teyr bê tirs blind difirin û ji xwe re jûrde li erdê dinêrin, divê mirov ji bê tirs azad bifikirin, bijîn û qeyd û bendan bişkîne. Weke qaz û werdekan çawa bê tirs xwe di çilê zivistanê de noqî ava cemidî dikin, divê mirov ji bê tirs hizir û ramanên xwe vebêjin, belav bikin. Weke zarokên nebaliq çawa bêsînor dihizirin û pirsan dikin, divê mirov ji bê sînor azadiyê û nirxên azadiyê biparêze. Bihûnin rist bi rist, qulf bi qulf hizir û û ramanên azadiyê û belav bikin. Biçirînin, bişkînin qeyd û bendên we li giyan, mejî û hizrên xwe dayîn. Bihêlin bila hûn azad bijîn.

# Desteya Kar û Barê Civakî desteka koçberan didomîne

Hevserokê Desteya Kar û Barê Civakî Farûq El-Maşî diyar kir ku xebata desteyê ji bo desteka koçberan didome û got, emê îsal xebata xwe zêdetir bikin.

Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê piştî civîna salane ya Meclisa Rêveber ku 18`ê Çileyê li bajarê Reqayê hate lidarxistin, encamên ku wê li ser wan bixebitin, eşkere kirin. Di civînê de rewşa koçber û kampên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê hat nîqaşkirin. Ev yek bi rêya daxuyaniyekê eşkere kir ku wê desteka koçberan bidomînin.

Hevserokê Desteya Kar û Barê Civakî ya Rêveberiya Xweser Farûq El-Maşî di vê derbarê de behsa zehmetiyên ku par rastî wan hatine, kir.

Farûq El-Maşî got di sala 2020`an de gelek pirsgirêkên ku xebatên wan asteng dikirin, hebûn, ji wan êrişên dewleta tirkî yên ser herêmê û wiha domand: "Korona jî li pêşiya me bû asteng. Lê tevî wê jî me alîkarî li hemû kamp û malbatên xizan li hemû herêman belav kir."

Li herêmên Rêveberiya Xweser gelek kampên ku bi hezaran malbatên koçber ên ji hundirê Sûriyê di wan de dijîn, hene. Herwiha koçberên ji Iraqê di kampa Holê de hene, kamp li herêma Şehbayê jî hene û koçberên Efrîna dagîrkirî di wan de dijîn.

Kampa Holê ji mezintirîn kampên li herêmên Rêveberiya Xweser e. Di payîza 2015`an de piştî herêma Holê ji DAIŞ`ê hate rizgarkirin, ji nû ve hate vekirin. Tê de malbatên ji Sûriyê ku ji ber şerê li herêmên di bin serweriya hikumeta Şamê de reviyane û penaberên ji Iraqê, dijîn.

Piştî rizgarkirina Baxozê baregeha dawîn a çeteyên DAIŞ`ê di Adara 2019`an de û piştî ku bi hezeran endamên malbatên DAIŞ`ê yên ji Sûriye, Iraq û biyanî xwe radestî QSD`ê kir, ew di kampa Holê de hatin bicihkirin.

Desteya Kar û Barên Civakî ya Rêveberiya Xweser lênerîna rewşa wan, pêşkêşkirina pêwîstiyên tenduristî û jiyanî girt ser milê xwe. Piştî herêma Serêkaniyê û Girê Spî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatin dagirkirin, Desteya Kar û Barên Civakî du kamp ji bo bicihkirina koçberan ava kirin. Kampek li gundê Tel El-Semin ê bakurê Reqayê ji koçberên Girê Spî re û kampa Waşûkanî ji koçberên Serêkaniyê re ava kir.

Farûq El-Maşî got desteyê Dibistana Şehîd Feysel El-Hiwêdî ya astengdaran li bajarê Reqayê vekir û wiha domand: "Ev dibistan ji xebatên girîng e ku me di 2020`an de pêk anî."



Derbarê sala 2021`an de El-Maşî piştерast kir ku deste xebatên girêdayî koçberan didomîne û ji bo pêşkêşkirina alîkariyê ji hemû kesên xizan re di nava xebatê de ne.

Hevserokê Desteya Kar û Barên Civakî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Farûq El-Maşî wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em amadekariyên vekirina mala sêwiyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin da ku zarokên bêxwedî yên li kolanan bi cih bikin û em ê derfetên kar ji kesên bêkar re peyda bikin."

## Bi derbasbûna astengiyan careke din vegera li jiyanê

**Leylan RESO/Qamişlo**

Dewleta tirkî ya dagîrker 9ê Cotmeha 2019an êrişî Serê Kaniyê kir û bû sedema koçberiya bi sedhezaran. Hin ji wan li kampan hatin bicîkirin, hin jî bi derfetên xwe li bajarên Rojava bi cî bûn. Îsa Cuma jî ku yek ji wan koçberan e û li bajarê Amûdê bi navê "Şîrîngeha Serê Kaniyê" dikanek vekiriye li ser koçberiya xwe wiha axivî

**"KU TU NE LI SER XAKA XWE BÎ WATEYA PÊDIVIYAN NÎNE"**

Derbarê mijarê de welatiyê bajarê Serê Kaniyê Îsa Cima yê 27 salî, li ser koçberiya xwe wiha axivî: "Bi destpêkirina êrişan re me berê xwe bi bajarê Reqayê vekir. Em heyvekê li wir bi cih bûn, piştre min berê xwe bi Kurdistanê vekir. Heta ku ez gihîştim wir min gelek zehmetî dît. Li wir ez di Kampa Giwêlan de bi cih bûm. Ew gelekî bi me re bûn alîkar û her pêdivî dihatin peydakirin. Lê wateya pêdiviyên jiyanê tineye ku ti ne li ser xaka xwe be. Hê li kar digeriyam heta ku karibim malbata xwe xwedî bikim lê mixabin nexweşiya Vîrûs Korona derket."

**"KEDA SALAN DI KÊLIYEKÊ DE HILWEŞIYA"**

Îsa Cima axaftina xwe wiha domand: "Ev demeke min dikana mamoniyî û gêmer vekiriye û min navê "Serê Kaniyê" lê kiriye. Li Serê kaniyê jî dikanek û du kargehên me yên şêrîngehê hebûn. Lê mixabin keda salan di kêliyekê de hilweşiya. Niha jî ez û birayê xwe bi hev re dixebitin. Ji ber ku bajarê Amûdê piçûke û dikana mamûniyê lê tineye min xwest ez vî karî bikim. Ev dikan ne tenê ji bo debara malê, ji bo jibîrkirina êşane heta ku em vegerin bajarê xwe. Em tenê tiştên sivik çêdikin ji ber ku hê tirs di dilê me de ku weke Serê Kaniyê li me were. Em dixwazin dikana xwe berfireh tir bikin lê ji ber gefên dewleta tirkî ya dagîrker em nikarin. Kêmaniyê ku derdikevin xaze. Me ruqset çêkir gotin hefteyê qenîneyek xaz tenê ji tere derdikeve. Qenînek têra min nake di hefteyê de kêmanî 4 qenîne hebin. Ku xazê nedin min ezê dikana xwe bigirm û berê xwe bi cihekî dinê vekim. Daxwaziya me ji komîna sûkê re komîteyekê çêkin û dakevin nava welatiyan û bibînin daxwaziyên wan çi ne."



**"JI MAFÊ ME YE EM LI SER XAKA XWE AZAD BIJÎN"**

Îsa Cima axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Em her dem dibêjin bila em li welatê xwe bimirin û ne li welatê xerîbiyê. Daxwaziya min ji rêxistinên navdewletî ew e ku ji bo vegera bajarê me çareseriyekê bibînin, hemû cîhan dizane ku em xwediyê vê xakê ne. Çima heta niha pirsgirêkê me nehatiye çareserkirin, ji mafê me ye ku em jî li ser xaka xwe azad bijîn. Em di mala xwe de û li ser erdê xwe bûn. Dewleta tirkî û çeteyên wê çi ji me dixwazin. Çima cîhan û rêxistinên qaşo mafê mirovan diparêzin bêdeng in? Xwesteka malbatên koçbere tevan ew e ku, vegerin bajarê xwe. Lewra ti dever ji mal û bajarê mirov, xweş nînin. Bi berxwedana YPJ-YPG û QSD`ê û hevgirtina gelên herêmê, emê bi ser bikevin. Herî dawî ez ji hemû dagîrkeran re dibêjim çi dibe bila bibe emê vegerin ser xaka xwe."




## Kargeha kîsên xêş li Tirbespiyê piştgiriyê dide aboriya herêmê

**Lêzan EBDIKÊ/Qamişlo**

Li bakur û rojhilatê Sûriyê di demên dawî de gelek kargeh vebûn. Ji wan yek jê ya kîsên xêş ya li navçeya Tirbesipiyê ye. Herwiha ev kargeh yek ji encamên xebata Rêveberiya Xweser e. Cara yekê ku kargeheke bi vî rengî li herêma Cizîrê vedibe. Kargeh ku berî sê salan vebû û bi hilberînê dest pê kir, pêdiviyên sûka herêmê pêk tîne. Di kargehê de hem karkerên jin, hem yên mêr hene. Ev kargeh di pêkanîna hewcedariyên gelên herêmê de roleke girîng dilîze. Bi vebûna vê kargehê re, li her devera herêmê êdî kîs peyda dibin.




**PÊŞKETIN DI HEMÎ WARÊN PÎŞESAZIYÊ DE**

Ji rêveberiya vê kargehê, Mihemed Xêr Cuma li ser xebata kargehê wiha axivî: "Kargeh di peydakirina pêwîstiyên cotkaran û aşan de jî roleke mezin dilîze. Herwiha kapasîteya hilberîna rojane di navbera 2500-3000 hezar kîsî de ye. Ji bo kargehê di peydakirina materyalên xav de, destpêkê me gelek zehmetî kişandin. Ji bilî wê di tiknîkê de jî zehmetî hebûn. Dema makîneyek xerab dibû me nikariya çêkin."

Xêr Cuma li ser axaftina xwe wiha zêde kir: "Me ji başûrê Kurdistanê û Çînê têl anîn. Ji bo wê gelek mesref lê diçû. Di ser de gumrik jî hebû. Heta pêdivî digihatin kargehê mesref li ser me dibû barekî giran. Lê niha em pêdiviyên xwe ji Kargeha Roj ya têlan ya li Dêrikê tînin."

**XELATKIRINA KARKERAN**

Xêr Cuma herî dawî ev agahî dan: "Destpêkê, ji bo sazkirina makîneyan û xebitandina wan, alîkarî ji pisporên herêmên din yên Sûrî dihat xwestin. Li ser bikaranîna makîneyan ji karkeran re perwerdeya taybet dihat dayîn. Lê niha kargeh bi kadroyên herêmî tê birêvebirin. Ji bilî çavdêr û rêveberan, 12 jê jin, 17 karkerên me hene. Mûçeyê karkeran 170 hezar lêreyên sûrî ye, lê carna karker tên xelatkirin jî. Kargeh rojê 16 saetan li ser du beşan dixebite. Beşa yekê ji saet 7ê sibê heta 3yê piştî nîro, ya din jî ji 3yan heta 11 êvarê."





## Hannîbal rê dît, Hayrî Durmuş rê vekir

**Farûk SAKIK**

Di dîrokê de gotinek, generalê Kartaca, Hannîbal Barca bi nav û deng heye. Dema ku Hannîbal bi 90 hezar eskerê xwe û bi hezaran fîl dixwaze di çiyayên Alpan de derbas bibin, rê li wan tê girtin û ji fermandarên xwe re wê gotina xwe ya dîrokî dibêje;"an emê rêyek bibînin an jî emê rêyek çêbikin". Hannîbal di dawî de rêyek dibîne û ji çiyayên Alpan derbas dibe.

Îro li dijî dewleta Tirk 'artêşa berxwedanê' ditekoşe û di vê têkoşînê de hukûmeta AKP-MHP'ê asê bûye. Hêzên demokrat, şoreşger li rêya çareseriyê digerin. Herkes dizane ku riya esas a ku pêşiya tevgerê vebike riya Rêber Ocalan e. jib o vê AKP di destpêkê de têkiliyên civaka Tirkiyê û Rêber Apo qût kirin.

Hinceta herî mezin û bêwate jî îlana rêveberiyên xweser bû. Gotin PKK çima xweserî îlan kir. Dan ji bîrkirin ku ew rêveberiyên xweser 2 mehan piştî şerê bi 72 balefiran destpêkiribûn hatibû îlankirin. Faşîzma Erdogan piştî ku bajarên kurdan ruxand ji bo kes jê hîsab nepirse dixwest rêya ku diçû Gerîlla bixitmîne. Çikir? Got: Xendek… Û bi gelek kesan da bawerkirin, biserket û rê hat xitimandin.

Li Tirkiyê krîza aborî, siyasî, civakî her ku diçe kûrtir û girantir dibe. Tirs û xofa hatî belavkirin bi serketî didomîne. Ji civakê yek deng dernakeve.

Di sala 1972an de Denîz Gezmîş li dijî artêşê û siyaseta demê ji cîwanan re pêşengî kir. Denîz Gezmîş, bi îdamkirina xwe rêyek di siyaseta Tirkiyê de vekir. Di van demê dawî de cîwanên Tirkiyê metodên berxwedana Denîz Gezmîş bibîrxistin. Li zanîngeha Bogazîçî serî bilind kirin û îroj dixwazin rêyek li dijî faşîzmê çêbikin. M. Hayrî Durmuş jî di taritiya 12'ê Îlonê de, li zîndana Amedê, di dema ku îşkence derketibû asta herî jor û hemû rê jî hatibûn girtin de, di 14'ê Tîrmeha 1982'an de rêyek vekiribû. Hannîbal rê dît, Hayrî Durmuş rê vekir.

Li Kurdistan jî Kurdistaniyan, berxwedana M. Hayrî Durmuş ya sala 1982'an anîn berçav. Îroj li Wan û Batmanê piştî salên bêdengiyê, dengê berxwedanê bilind dibin.

Lê rêya esas, rêya ku herdu hêz bigihîjin hevdu, bibin yek û berbi rêya gerîlla ve bimeşîne ye.

Îro li çar aliyên cîhanê, ji bo azadiya Ocalan daxwuyanî tên dayîn û azadiya rêber Apo wek çareserkirina gelek pirsgirêkên xwe dibînin. Heger Tirkiyê hê jî ev yek nehatibe dîtin, ji ber xemsarî û korbûna ye.

Di navbera Gerîlla û Hannîbal de ferqek hebû. Hannîbal ji bo dagirkirina heremek diçû û rê dîtibû. Artêşa Berxwedanê jî ji bo faşîzmê têkbibe, ji bo bi azadiya Ocalan rê veke ku bigîhêjin gerîlla.



# Koordînasyona Jinan bû beşek ji sazûmaniya Rêveberiya Xweser

Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser di civîna xwe ya asayî de Koordînasyona Jinan beşek ji sazûmaniya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê pejirand.

Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê civîna xwe ya asayî ya bi jimara 33'an bi beşdarbûna meclisên qanûsaz yên tevayiya rêveberiyên xweser û sîvîl û seroka Desteya Rêveber ya MSD'ê Ilham Ehmed li dar xist. Di civînê de raporên Meclisa Giştî, meclisên qanûnsaz yên rêveberiyên xweser û sîvîl yên bakur û rojhilatê Sûriyê hatin xwendin.

Ilham Ehmed, rewşa siyasî nirxand û nêzîkatiyên Rêveberiya Xweser ji merc û guhertinên ku rûdidin şîrove kir.

Beşdaran rewşa rêxistinî nîqaş kir. Jozef Lehdo wekî cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û bojhilatê Sûriyê li şûna Elîzabeth Gewriyê sond xwar.

Bi erêkirina beşdaran, Koordînasyona Jinan bû beşek ji sazumaniya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê.

Herwiha xebata meclisên qanûnsaz yên rêveberiyên xweser û sîvîl yên bakur û rojhilatê Sûriyê û pirsgirêkên ku di sala 2020'an de derketin, hatin nirxandin û ji bo sala nû gelek pêşniyar hatin kirin.



## Emê we bi hêza xwe têk bibin



**Jiyan BOZO/ Qamişlo**

Civaka Êzîdî careke din dibe hedefa dagîrkeran. Dewleta Tirkî ya dagîrker gefên dagîrkirina Şingalê xwar, da fermna 2014an nû bike. Jinên Êzîdî yên berdêlên giran dayîn, helwesta xwe diyar kirin.

**"BI SAYA PKK`Ê EM ÎRO XWEDÎ HÊZ MAF IN"**

Têkîldarî mijarê berdevka Tevgera Azadiya Jinên Êzîdî Sebîha Sebrî wiha axivî: ''Dewleta tirkî ya dagîrker dîsa gefan li Şingalê dixwe. Armanca wan nûkirina fermana 2014an e. Daxwaziya wan ew e ku civaka Êzîdî tine bikin. Piştî gelê me vegeriya ser xaka xwe û rêveberiya xwe ava kir, ev gef pirttir bûn. Ji ber ku dewleta tirkî ji hevgirtina civaka me ditirse gefên xwe zêdetir kirin. Herwiha peymana di navbera Bexda û Hewlêrê de plana Tirkiyê ya ji bo têkbirina vîn û rêxistina gelê me ye. Ev êriş bi desteka PDKê tê kirin. Malbata Berzanî xencera di piştê de ye û ji kurdîtiya xwe dûr ketine. PDKya li civaka me xiyanet kirî û radestî DAIŞê kir, divê hesab bide. Mafê vê hêza xayîn yê biryaran li ser Şingalê nîne. Em xwediyê vê xakê ne û emê biryara wê didin. Hêzên dagîrker dixawzin bi behaneya PKKê hêzên me tine bikin. Lê ji bilî PKKê ti kes li me xwedî derneket. Ji ber wê em Êzîdî deyêndarên wan in. Bi saya PKKê em îro xwedîhêz û xwedîmaf in."



**ME BI VÎNA JINA BERXADÊR DAIŞ TÊK BIR, EMÊ WE JÎ LI ŞINGALÊ TÊK BIBIN**

Sebîha Sebrî axaftina xwe wiha domand: "Hêza (PKK) rûmeta me parastî sala 2017an bi awayekî fermî û li ber çavê cîhanê ji Şingalê vekişya. Yên niha Şingalê diparêzin zarokên me ne. Bi van behaneyan bi taybetî di kesayeta jina Êzîdî de dixwazin civaka me û Kurdan tevan tine bikin. Ji bo şkandina van êrişan pêdiviya me Kurdên Êzîdî bi yekîtiyê heye. Me bi hezaran şehîd dan, divê em li keda wan xwedî dekevin û çi dibe bila bibe emê li dûv riya wan bin. Em jinên Şingalê ti carî qebûl nakin ku kesên xiyanet li me kirîn û bûyîn sedema destdirêjî, kuştin, revandina jinên Êzîdî derbasî xaka me ya pîroz bibin. Em jin û gelê Şingalê van gefan bi dijwarî red dikin. Wê zarokên me vê xakê biparêzin. Em ti hêzên din qebûl nakin. Dewlate tirkî ya dagîrker jî bila baş bizane ku me bi vîna jina berxadêr DAIŞ têk bir, emê we jî li Şingalê têk bibin."

Berdevka Tevgera Azadiya Jinên Êzîdî Sebîha Sebrî bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Yê carekê xiyanetê bike wê her car bike. Ji bo wê banga min ji gelê Kurd û civaka Êzîdî re heye. Xetereke mezin li ser Şingalê heye, divê em şiyar bin û li hemberî van gefan yekîtî ya xwe ava bikin. Da em destkeftiyên xwe li Şingalê biparêzin."

## Gaveke nû ji bo aboriya jinan

Ji bo pêşxistina aboriya jinan û peydakirina derfetên kar ji jinan re, Komîteya Aboriyê ya Şedadê firinek vekir.

Komîteya Aboriyê ya Jinan ya navçeya Şedadê bi vekirina projeyan piştgiriya jinan dike.


Vê dawiyê bi desteka Desteya Aboriyê firûnek hat vekirin. Firûn bi peymana di navbera Xedîce Ehmed û Fatima Ewad û Komîteya Aboriyê de çêbû.

Derbarê mijarê de Xedîce Ehmed wiha got: "Ev firûn xewna min bû, lê rewşa aborî rê nedida. Projeya firûnê serkeftî bû, lewre herêm mezin e û pêwîstiya wê bi miqdarekî mezin ya nan heye. Piştî ku em pêwîstiyên şêniyan bi cih tînin, em her nanî bi 100 lîreyên Sûriyê difiroşin xwaringehan."


Endama Komîteya Aboriya Jinan ya navçeya Şedadê Menar Ilêwî diyar kir ku firûn bi alîkariya du jinên ji gundewarê Şedadê vekirine û got, pereyên 3 mehên destpêkê ji sedî 5 ji Desteya Aborî re ye ango piraniya pereyên ku firûn 3 mehên destpêkê derxe, ji her du jinan re ne."

Menar Ilêwî diyar kir ku armanca wan ew e ku piştgiriya aboriya jinan bikin, derfetên kar ji wan re peyda bikin û got, em hewl didin vê projeyê berfireh bikin û endaman zêdetir bikin.

*ANHA*







## Projeya me, projeya 15 hezar şehîdî ye

Endamên rêveber yên Reqa kuştina Seida El-Hermas û Hind El-Xidêr şermezar kirin û gotin, êrişa ser jinan hewldana ji bo lewazkirina projeya demokratîk ya li bakur û rojhilatê Sûriyê ya bi pêşengiya jinan e.

Çeteyên DAIŞ`ê 22`yê Çile Hevseroka Meclisa bajarokê Til El-Şayir yê navçeya Deşîşa ya kantona Hesekê Seida El-Hermas û cîgira wê Hind El-Xidêr kuştin û ev sûc jî li sûcên plankirî yên komên girêdayî dewleta tirkî ya dagîrker, zêde dibe.

Bertekên li dijî kuştina her du jinên têkoşer dewam dikin.

Cîgira Hevserokatiya Desteya Rêveberiya Herêmî û Jîngehê ya Rêveberiya Xweser Hêvîn Şêxo, li ser mijarê axivî. Hêvîn Şêxo diyar kir ku serkeftinên jin bi dest dixin serê dewleta tirkî ya dagîrker tevlihev dike û wiha got: "Serkeftinên ku jinan li bakur û rojhilatê Sûriyê bi dest xistîn, dihêle ku dewleta tirkî her tim di nava fikaran de be. Em xwedî tifingeke xurt in ku pê şer dikin. Tifinga me fikir û serkeftina li pêşberî cîhanê pêk aniye."

Hêvîn Şêxo da zanîn ku dewleta tirkî her tim hewl dide deng, hêz û îradeya jinan bişkîne. Sûcê li dijî Hind El-Xidêr û Seida El-Hermas vê nîşan dide. Hêvîn got, bila dinya ji vî sûcê li dijî jinên azad hatî kirin, şerm bike."

**DIXWAZIN PROJEYA ME TÊK BIBIN, LEWRE BANGA AZADIYA JINAN DIKE**

Hêvîn Şêxo di dewama axaftina xwe de bal kişand ser armanca bingehî ya sûcên kuştinê û wiha pê de çû: "Armanc têkbirina îradeya jinê û projeya demokratîk ya li bakur û rojhilatê Sûriyê ye ku ji aliyê jinan ve tê birêvebirin. Lewre ev proje banga azadiya jinan dike û jin li van herêman bûne mînak."

**EMÊ LI BER XWE BIDIN LEWRE EM MAFDAR IN**

Hêvîn Şêxo da zanîn ku projeya Rêveberiya Xweser xwe dispêre hêmanên sereke, ji wan azadiya jinan e. Ji ber wê çeteyên dewleta tirkî û DAIŞ hewl didin vîna azad ya jinan bişkînin.

Hêvîn Şêxo soza şopandina riya şehîdan da û wiha axaftina xwe bi dawî kir:"Projeya me projeya 15 hezar şehîdî ye, emê tawîzan nedin, berovajî emê têkoşîna xwe xurttir bikin."





Endama Nivîsgeha Rêxistinkirina Jinan ya Meclisa Jinan ya Sûriyê Suhêr El-Senûh jî got, gelê me ji ber kiryarên komên girêdayî dewleta tirkî hê azaran dikişînin, nexasim di demên dawî de û ji cîhanê re isbat kir ku terora wan pîvan, qanûnên navneteweyî û nirxên exlaqî derbas kirine."

# Norman Paech: Divê Ocalan demildest bê berdan

**Prof. Norman Peach diyar kir ku tecrîdkirina 22 salan pêkanîneke zalimane û dermirovî ye. Rêber Abdullah Ocalan dikare di mûzakereya konsepta aştiyê de bibe kesê bingehî û got, divê demildest were berdan.**

Prof. Norman Peach diyar kir ku dewleta tirkî nikariye armanca xwe ya îzolekirina rêber Abdullah Ocalan pêk bîne û got, niha jî Ocalan hêza siyasî ya herî mezin e ku bûye alîkar ku Tirkiyê veguherîne welatekî aştiyane, demokratîk û civakî.”

Insiyatîfa navneteweyî ya ‘‘Ji Abdullah Ocalan re Azadî-Li Kurdistanê Aştî’’ ku piştî rêber Abdullah Ocalan ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve hat dîlgirtin hat avakirin, di gelek xebatên navneteweyî de cih girt. Pirtûka bi navê Diyalogên Avakirina Jiyana Azad ku berhemeke wê ye, çend akademîsyen, nivîskar û şoreşgerên ku bi fikrên rêber Abdullah Ocalan re eleqedar bûn û ji wî îlham girtin, anîn cem hev. Me ev hevpeyvîn bi nivîskar Norman Paech re ku cihê xwe di çêkirina wê pirtûka ku cara yekê di sala 2019’an de ji aliyê Weşanxaneya Aram ve di salvegera 20. ya Komploya Navneteweyî de hat weşandin, çêkir.

Di vê hevpeyvînê de, li ser tecrîdkirina rêber Abdullah Ocalan profesor Norman Paech ji ajansa me re axivî.

Norman Paech armanca komploya navneteweyî di pirtûka ‘Diyalogên Avakirina Jiyana Azad’ de wiha rave kiriye: “Komplo bi armanca tesfiyekirina Ocalan pêk hat. Lêbelê hedefa van hemûyan ji mirovekî pirtir sembola têkoşînê bû. Bêguman ji bo vê armancê demanceyek jî hat bikaranîn ku sefîrê bilind yê Yewnanistanê yê li Kenyayê da Ocalan lê ne ji bo xweparastinê, ji bo xwekuştinê!” (rûpel 22-23).

**‘TECRÎDA 22 SALAN KIRYAREKE ZALIMANE Û DERVEYÎ MIROVAYIYÊ YE’**

Paech, rêber Abdullah Ocalan wek siyasetmedar û rêberê sereke yê tevgera kurdî ya Tirkiyê bi nav kir û diyar kir ku tecrîda 22 salan kiryareke zalimane û dermirovî ye û wiha got: “Komplo ji bo lewazkirina xweserî û naskirina nasnameya kurdan pêk hat. Eger Emerîka û Îsraîl û herwiha Almanya, Hollanda û Yewnanistanê nedayîna mafê penaberiyê ji Ocalan re destek nekirana, wê Tirkiyê nikaribûya rêber Ocalan dîl bigire.”

**‘KOMPLO BINPÊKIRINEKE EŞKERE YA PEYMANA PENABERAN YA CINÊVÊ YE’**

Paech got redkirina daxwaziya penaberiyê ya rêber Abdullah Ocalan berî kompoloyê, binpêkirina Peymana Penaberan ya Cinêvê ye û wiha pê de çû: “Bêguman Ocalan penaberekî siyasî bû ku mafê penaberiyê jê re hat dayîn lê belê sirgûnî wan welatan hat kirin ku nehiştin bikeve hundirê xaka wan.”

**‘DI KONSEPTA MÛZAKEREYÊN AŞTIYÊ DE OCALAN KESÊ NAVENDÎ YE’**

Peach bal kişand ser pêşengiya rêber Abdullah Ocalan û wiha got: “Abdullah Ocalan, li ser bingehekî wekhev dikare bibe kesê navendî ji bo danûstandina konsepta aştiyê. Nelson Mandela 27 salan li girava Roben asê ma, tecrîd bû û piştre bû serokê navdar yê Afrîkaya Başûr ya azad û demokratîk. Divê Abdullah Ocalan di pêvajoyeke ew qas dirêj û dermirovî de neyê girtin. Niha jî dikare bibe hêza siyasî ya herî mezin ya aştîxwaz û demokratîk ya Tirkiyê.”

**NORMAN PAECH KÎ YE?**



Norman Paech li Zanîngeha Hamburgê profesorê fexrî ye, di heman demê de parlamenterê berê û pisporê hiqûqa navneteweyî ye. Di 12’ê Nîsana 1938’an de li bajarê Bremenê yê Almanya ji dayîk bû. Paech li Bonnê li Wezareta Hevkariya Aborî ya Federal dest bi kariyera xwe kir. Wî li Hamburgê li Navenda Lêkolînê ya Federasyona Zanyarên Alman karê xwe yê lêkolînê berdewam kir. Paech, di 1975’an de li Zanîngeha Hamburgê profesorê zanistên siyasî bû, piştre li Zanîngeha Aborî û Siyasetê ya Hamburgê dersên hiqûqa giştî dan.

*CÎHAN BÎLGÎN/ANHA*



## Rûsya siyasetek xerab dimeşîne!

**Ahmet AKTAŞ**

Piştî şantaj û lîska wan a li Eyn Îsa bi ser neket, hez dikin li deverên din provakasyonan çê bikin.

Ji xwe, dewleta Tirka, li deverên dagirkirî zulma faşîzan li ser gelê ku maye li wira didin meşandin; dikuje, êşkence dike, di revîne, fîdye dixwaze û her deverê talan û wêran dike. Li deverên nêzî yên dagirkirî topbaran dike û jiyanê aloz dike.

Li aliyê din, wisa tê gûman kirin ku piştî wan civînên li gel Rûsya yê, gihiştine hinek biryaran.

Li pey van danistandinê Rûsya û Tirkiye yê, topbaranên li herêmê zêdetir bûn û li Hesekê, Qamişlo bûyerên balkêş ên provakatîf ji aliyê rejîma Şamê hatin despêkirin. Eger ne ji hişyarbûn û hilwesta xurt a Rêveberiya Xweser bûya, bûyerên xerabtir da rû bidin.

Bêgûman xetera van lîstik û provakasyonan xelas nebûye. Diyar dibe ku ew guhertina reveberiya li DYE, Rûsya gelek xemgîn kirî ye. Li gorî daxwiyaniyên hinek payedarên rêveberîya nû a Emerîka, ew ê siyaseta li dijî Rûsya û Tirkye yê dijwartir û hişktir bikin.

Lewma Rûsya jî, dixwaze ku hîn vê rêveberiya nû a Emerîka xwe organîze nekiri bi lezgînî hevalbendên xwe yên Tirkiye û Îranê bixe nava hinek provakasyonan.

Dibîne ku PYNK û ENKS, civînên xwe yên lihevhatinê dîsa didin despê kirin, ev jî ne li goreyî siyaseta Rûsyayê ye. Li vê herêmê pêşveketina siyaseta DYE’yê, tê wateya paşveketina wan. Lewma ji bo ev lihevhatina hêzên kurdî pêk neyên, van hewldanên kambax, bi rêya rejîma Şamê zêdetir dikin.

Dewleta Tirka, ji van hewldanên qirêj ên dijî doza kurdan û bi taybetî yên dijî Rojava amade ye, eger tirsa wê nebe hema wê êriş bike û her deverê Kurdistanê dagir bike.

Tirsa dewleta Tirkan ji gelek alî ve heye. Ji alîkî ve ew ê weke berê ji dewleta Emerîka piştgriyê nebîne. Her wiha ji Rûsyayê jî bi tememî ne piştrast e.

Dibe ku li ser kurda li gel Îranê heta radeyekê bimeşe, lê bi temamî her du dewlet jî baweriyê bi hevdu nayê. Li aliyê din jî, bi bingehîn tirsa wê ji berxwedana lehengî ya gelê kurd e.

Di têkiliyên xwe yên derve de, ketiye çi halê xerab diyar e. Li hundur jî, her roj ji roja din xerabtir dibe û desthilatiya AKP-MHP’ê êdî diheje û di lerize.

Hilbet ne bê hewldane. Weke mînak ji bo navbêna xwe û Almana hinekî xweştir bike hewldide û dibe ku hinek soz jî standibe. Lê weke mînaka hêştirê lê hatiye; jê pirsîne “ma gelo çima stuyê te xware”, bersîv daye gotiye “ma kêderê min rast e?”. Devereke tenê pîne bike jî, bi hezaran dever dirya ye, êdî nema pîne jî bi kêr tê!

## Aldar Xelîl: Felsefeya rêber Ocalan banga azadî û demokrasiyê ye

Aldar Xelîl diyar kir ku dewleta tirkî ji ber fikirên rêber Abdullah Ocalan yên banga azadî û demokrasiyê dikin, tecrîdeke girankirî daniye serê.

Komîteya Rêbertiyê ya Rojava bi nêzîkbûna 15`ê Sibatê salvegera 22`yan ya Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan rêzeçalakiyan li dar dixe. Di vê çarçoveyê de civîneke berfireh li dar xist. Gelek kesayetên bi rêber Abdullah Ocalan re rûniştîn, tev li civînê bûn.

Civîn li Navenda Aram Tîgran ya Çand û Hunerê ya li bajarokê Rimêlanê bi tevlêbûna 250 kesên ji kantona Qamişlo li dar ket.

Di civînê de endamê Desteya Hevserokatiyê ya PYDê Aldar Xelîl axivî û Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan şermezar kir. Xelîl got, komplo di demekê de ku emperyalîzm û zordestî tê de belav e, pêk hat û rêber Abdullah Ocalan û kesayetên banga azadî û demokrasiyê dikin, kir hedef.”

Xelîl diyar kir ku pergala emperyalîst dixwaze şerên li Rojhilata Navî li dar be, da ku ajandeyên xwe pêk bîne û bi bîr xist ku sala 1996`an gelek caran hewl daye rêber Abdullah Ocalan bikuje lê bi ser neketiye.

Xelîl diyar kir ku dewleta tirkî heta niha qanûnên navneteweyî yên têkildarî girtiyan pêk nayne û hevdîtinan li gel rêber Abdullah Ocalan qedexe dike.

Xelîl wiha domand: “Kurdistan li ser siyasetên dewletên desthilatdar ne xeter e lêbelê fikrên rêber Abdullah Ocalan li ser wan xeternak in. Ji ber ku banga azadiyê û demokrasiyê dike. Fikrên wî li tevahiya cîhanê belav bûn, di nav de Îtalya, Spanya û Brîtanyayê. Êdî gel hemû banga azadiyê û demokrasiyê dikin.”

Xelîl di dawiya axaftina xwe de bal




kişand ser êrişên dewleta tirkî yên li dijî herêmê û wiha got: “Ji ber ku şoreşa me li ser rêgezên fikrên demokratîk û biratiya gelan ên ku rêber Abdullah Ocalan banga wê dikin ava dibe, dewleta tirkî êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike û dijbera şoreşa me ye.”

## Koçberên Efrînê: Armanca Enqere û Şamê şkandina vîna me ye

Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê her ku diçe zêdetir dibin. Herwiha hikumeta Şamê bi lihevkirina bi dewleta tirkî re koçberên Efrînê dorpêç dike da desthilatiya xwe çêke.

Şêniyên Efrînê yên ku koçberî kantona Şehba bûyîn, ji ANHA re axivîn. Welatiyê bi navê Reşîd Qebilan Yê ji navçeya Reco ya kantona Efrînê behsa gef û êrişên li dijî herêmê kir û wiha got: “Berxwedana me li Kampa Serdem dikeve sala 4`an. Tevî astengiyên em dikişînin, hêviya me ya vegera Efrînê mezin e.”



Qebilan diyar kir ku çiqas êrişên dagîrkeran û lihevkirinên li dijî wan zêde bibin, ewqas israr û berxwedana wan ya ji bo vegera Efrînê jî zêde dibe û got, welatên ku qaşo pesnê demokratîkbûna xwe didin, ji bo xizmeta gelan ti insiyatîfên mirovî pêşkêş nakin, berûvajî wê hewl didin ku fitneyê û şer di nava gel de derxin û sûcan li dijî wan pêk tînin. Ew sûc bi hevkariya hikumeta Şamê û dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê, dibin.”

Welatiya bi navê Leyla Mihemed jî bêdengiya aliyên navneteweyî şermezar kir ku li hemberî koçberên Efrînê erkê xwe pêk naynin û wiha got: “Armanca hêzên Kurdan ku şerê DAIŞ`ê kirin, parastina herêman bû. Wan li şûna cîhanê tevê şerê terorê kir, lêbelê civaka navneteweyî li hemberî me helwesteke neyînî nîşan da.”

Leyla da zanîn ku dewleta tirkî bi her rêbazê şerê gel dike û got, ew ji aliyekî ve û hikumeta Şamê ji aliyekî din ve me dorpêç dikin. Ew siyaseta birçîkirinê ji bo desthilata xwe li ser gel bi kar tînin. Lêbelê wê armanca wan pêk neyê. Emê li hemberî komplo û planan li ber xwe bidin. Lewre em bi hêviya vegera Efrînê dijîn.”

Ednan Mamo yê ji şêniyên navçeya Şêrewa jî got, em ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, di rewşeke zehmet de ne. Ednan her wiha diyar kir ku dorpêçê û siyasetên li dijî gel red dikin û hêvî dikin ku vegerin warê xwe.



# Deriyê Sêmalka careke din vebû

Rêveberiya deriyê sînor yê Sêmalka ragihand ku ji roja Duşemê ve derî careke din vebûye.

Rêveberiya deriyê Sêmalka têkildarî mijarê li ser maplera xwe ya Facebookê ragihand ku ji roja Duşemê ve (8’ê Sibata 2021’ê) derî careke din dest bi karê xwe kiriye, da ku rêwî derbas bibin.

Rêveberiyê diyar kir ku roja Şemî-Duşem-Çarşemê ji bo derbasbûna rêwiyan hatine diyarkirin.

Rêveberiya deriyê Sêmalka 3’yê Sibatê giştînameyek weşand, tê de girtina deriyê sînor ji hêla başûrê Kurdistanê ve hat ragihandin. Berpirsê Têkiliyan yê



deriyê Sêmalka Baz Ehmed ji ajansa nûçeyan ANHA’ê re got, rêveberiya deriyê Pêşxabûr ji ber sedemên rêxistinî û rûtînî çend rojan deriyê sînor girt.

# Çeteyên dewleta tirkî li Efrînê revandina sivîlan didomînin

Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê 6 sîvîl ji kantona Efrînê ya dagîrkirî revandin û heta niha çarenûsa wan nayê zanîn.

Li gorî agahiyên çavkaniyên herêmî ragihandîn, çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker roja Înê welatiyê bi navê Rohat (37) dema ku ji bo kirîna pêdiviyên werşeya dirûnê ji bajarê Efrînê diçû Ezazê, revandin.

Çavkaniyê diyar kir ku kesê hatî revandin karê dirûnê dike û ji gundê Erendê yê girêdayî navçeya Şiyê ya Efrîna dagîrkirî ye.

Hinek çavkaniyên din diyar kirin ku çeteyên bi navê “Lîwaya Semerqend” yên girêdayî artêşa tirkî ya dagîrker, 4’ê vê mehê 5 ciwan ji gundê Kefersefrê yê navçeya Cindirêsê revandin.

Çavkaniyan da zanîn ku navên kesên hatîn revandin wiha ne; Ehmed Hesen Mamed, Hesen Hesen Has, Murad Seydo Xilo, Ebdo Mihemed Ebdo Mecîd û Mihemed Xelîl Murad.

Heta niha çarenûsa 6 kesên hatîn revandin û cihê birînê, ne diyar e.

# Ragihandin dixwaze bibe zemînê yekîtiya neteweyî

**Jiyan BOZO/Qamişlo**

Ji bo xurtkirina têkilî û avakirina sîstemeke hevbeş, şanedeya raghandinê ya Rêveberiya Xweser û Yekîtiya Ragihandina Azad çûn başûrê Kurdistanê. Şande ji hevserokê ofîsa Raghandina bakur û rojhilatê Sûrî Amir Murad û hevserokên Yekîtiya Raghandina Azad Bengîn Sîdo û Evîn Yûsiv pêk tê.

**“DI DAWIYA VÊ SERDANÊ DE WÊ PROTOKOLEK WERE IMZEKIRIN”**

Derbarê serdanê û plansaziya şandeyê de, hevserokê Ofîsa Raghandina bakur û rojhilatê Sûrî Amir Murad ji rojnameya me re wiha axivî: “Armanca vê şandeyê danasîna kar û xebata ragihandinê ya li bakur û rojhilatê



Sûrî bi civak û rojnemevanên başûrê Kurdistanê û xurtkirina têkilyên di navbera rojnemevanên her du aliyan de. Herwiha em dixwazin bigihin nerîneke hevbeş û çareseriya pirsgirêk û dozên her du aliyan. Digel van armanceke me jî berfirehkirina têkîliyên me û tevayiya saziyên raghandinê yên fermî û ne fermî yên herêmê. Bi vî awayî emê bikarin têkîliyên xwe yên raghandinê yên derveyî welat xurttir bikin û di vê pêvajoyê de



ragihandineke xurt û pêşketî ku xizmeta şoreşa me bike ava bikin.”

Amir Murad axaftina xwe wiha qedand: “Me serdana saziyên fermî yên raghandina herêma başûrê Kurdistanê, yên weke Sendîkeya Rojnemegeriyên Kurdistanê, Rêveberiya Çapemenî û balevkirinê, kir. Herwiha serdana Wezareta Çandê û Ciwanan, Komîteya Ragihandinê ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê hat kirin. Bêguman serdana me gelek baş bû. Aliyê din jî bi awayekî pir baş û erênî nêz bûn. Herwiha mijara vekirina ofîsa Ronahî TV jî xaleke sereke ya van hevdîtinan bû. Di dawiya vê serdanê li ser xalên ku her du alî di wan de hemfikir bin wê protokolek were imzekirin.”

# Kesayetên bi rêbar Apo re civiyayîn soza xurtkirina têkoşînê dan

Kesayetên welatparêz yên bi rêber Abdullah Ocalan re civiyayîn, diyar kirin ku rêbertî her tim banga xwerbiêxistinkirin, jiyana aştiyane ya hevbeş û yekîtiyê dikir.

Komîteya Rêbertiyê ya Rojava, di çarçoveya çalakiyên bi pêmana salvegera 22. ya Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan de, civîneke girseyî li ser asta kantona Qamişlo li dar xist. Civîn bi durişma “Dem dema azadiya rêber Apo ye û azadiya rêber Apo azadiya mirovayiyê ye” li navenda Aram Tîgran ya Çand û Hunerê ya bajarokê Rimêlanê li dar ket. Kesayetên welatparêz yên bi rêbertiyê re civiyayîn di civînê de amade bûn.

Di civînê de beşdaran qala hevdîtinên xwe yên bi rêber Abdullah Ocalan re kir û diyar kirin ku rêbertiyê her tim banga xwebirêxistinkirinê, çareserkirina nakokiyên navxweyî û belavkirina fikirê azadî û demokratîk dikir.

Herwiha dan zanîn ku rêber Ab-



dullah Ocalan banga xurtkirina berxwedan û têkoşînê li hember dijmin dikir.

Beşdaran da xuyakirin ku rêber Abdullah Ocalan banga piştgiriya ciwanan dikir. Lewre pêşengên civakê ne û gotin, rêbertiyê banga girîngiya perwerdekirina gelan dikir da ku civak pêş bikeve û parastina destkeftiyên gelê azad bikin.

Beşdaran di nava nîqaşên xwe de bal kişand rola jinan ya di civakê de û wiha gotinên xwe domandin: “Jin bi saya fikirê rêber Abdullah Ocalan ji hişmendiya mêrên desthilat rizgar bû û di şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê de ji jina têkoşer ya azad re bû mînak.

Civîn bi şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan û soza xurtkirina têkoşînê bi dawî bû.

## Pirsgirêka kurdî êdî pirsgirêka dinyayê ye



**Zekî BEDRAN**

Hêzên li Rojhilata Navî yên şer û krîza kûr, dewleta tirkî yek wan hêzan e. Êdî pirsgirêk bi Rojhilata Navî ve sînordar namîne. Tirkiye ji bo dinyayê tevê bûye çavkaniya xeterê. Tirkiye qaşo parçeyek ji sîstema kapîtalîst ya Emerîka û Ewropa û endama NATO ya. Îro hebûna NATO xistiye rewşa nîqaşê. Çawa ku birêz Macron neçar ma ku bêje, mirina NATO ya mejî pêk hatiye. Tirkiyê fûzeyên S-400 yên Rûsya anîn di sîstema NATO de bi cî kirin. Emerîka û Ewropa nikarîn Tirkiyê bisekinînin. Di dawiyê de li ser ambargoya li dijî Tirkiyê nîqaş kirin.

Tirkiye çima ji bo Rojhilata Navî evqas bû xerabkar û hat rewşeke wisa ku gefan li Ewropa û Emerîka bixwe. Tirkiye bi aborî, artêş û sîstema çek ve enceq evqas di sîstema kapîtalîst de binakok be. Emerîka û Ewropa ketine derde wî qasî ku Tirkiye zêdetir nêzîkî Rûsya nebe. Tirkiyê li Sûriyê bi hêzên tarî û dijminên mirovayiyê yên wke DAIŞ û El Nusra re itîfaq kir. Îro Tirkiyê ji Ixwaniyan heta DAIŞ, El Nusra çeteyên şer kirîn çavkaniya debara xwe, li dora xwe kom kirine û wan diparêze. Ku Sûriye ketiye gêreke bixwîn û ber bi şerê navxweyî ve çûye, Tirkiyê rolê sereke lîst û sînorê xwe vekir. Ji bo derbasbûna çeteyên weke DAIŞê ji her devere dinyayê hêsanî çêkir. Bi milyonan koçber li hemberî Ewropa bi kar anîn. Hema hema Ewropa kilît kir, kir rehine.

Sedema ku Tirkiyê wiha bilez xwe berda Sûriyê û Rojhilata Navî kir qada şer, pirsgirêka kurdî ye. Bêguman hewesa wê ya ku li herêmê bandora xwe zêde bike, erd bi dest bixe û xwe bigihîne çavkaniyên petrolê jî heye. Lê mijara sereke dijminiya Kurdan e. Piştî Sedam û bi pêşengiya Emerîka dema Destûra Iraqê hat çêkirin, Tirkiye li derve hat hiştin. Başûrê Kurdistanê di çarçoveya destûrê de gihat statûyekê. Ji bo ku heman tişt li Sûriyê jî ji bo Kurdan çênebe tişta ji destê wan hatî kirin. Halbiku li sûriyê jimara Kurdan kêm bû, ji bo Tirkiyê nedibûn tehlûke. Di tevlîheviya li Sûriyê de ji bo xweparastinê xwe bi rêxistin kirin û şerê DAIŞê kirin. Herwiha xebitîn xwe bi rê ve bibin.

Li Rojhilata Navî hêzeke weke Kurdan li hemberî DAIŞê bi biryar û bi duristî şer kirî tinebû. Piştî ku DAIŞ hem ji bo herêmê, hem ji bo dinyayê bû xeter, Emerîka û koalisyonê biryar dan ku bi Kurdan re hereket bikin. Kurd jî bi biryar û girêdayî pîvanên baweriyê yên şirîkatiyê xebitîn. Ji bo vê bi gelê Ereb re ser 10 hezarî re şehîd dan. Ji bo perçiqandin û tesfiyekirina Kurdan Tirkiyê bi DAIŞ û El Nusra re itîfaq kir. Di her warî de destek da wan. Sînorê xwe ji wan re vekir. Digel van tevan her ku Kurdan DAIŞ ji herêmên xwe derxistin, Tirkiye dîn û har bû û bû weke cenawireke ji kontrolê derketî. Ji bo perçiqandina Kurdan bi Rûsya re itîfaq kir. Divê mirov standina S-400 jî ji bo Efrînê ji Rûsya re bertîl bibîne. Rûsya jî çawa ku xezîneyekê bibîne kartê Kurdan bi kar anî. Fît dan Tirkiyê û bere wê da rojhilatê Firatê û destek daye. Trump jî bi bazareke qirêj destûr dayê ku Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr bike. Ciyê Tirkiyê ketiyê li tevan qirkirina neteweyî kir. Li gorî rêxistinên mafên miriovan yên NY sûcên şer pir kirine. Trump got, şerê Tirk û Kuran yê du sed salî heye, em tevlî vî şerî nabin, emê ji herêmê derkevin. Rûsya, Tirkiye, Sûriye çi dikin bila bikin. Halbiku cara yekê Emerîka li Sûriyê bi saya hevkariya bi Kurdan re bi dagîrkerî nehatibû binavkirin û itibar standibû. Herêmên sînor tev ji Rûsya re hiştin. Bê ku bedelekê bide Rûsya bû xwediyê destkeftiyên mezin. Itibara Emerîka ya li dinyayê nema. Emerîka got, em ne mecbûr in ji bo Kurdan şer bikin. Daxwazî û hêviyeke Kurdan ya wisa tinebû. Lê eger qada hewayî li ber Tirkiyê bigirta bes bû. Eger Trump leşkerên xwe nekişandibûna û qada hewayî venekiribûya, Tirkiyê nikariya bikeve Sûriyê. Tirkiye hem Rûsya, hem Emerîka bi kar tîne û bi wî awayî dixebite ku Kurdan tesfiye bike û li Sûriyê bandora xwe ava bike.

Ev polîtîkaya Emerîka û Ewropa demoraziya tirkî jehir dike. 40 Sal in Tirkiye li ser Kurdan polîtîkaya inkar û tinekirinê dimeşîne. Tirkiye rojane başûrê Kurdistanê bombebaran dike. Bi dehan baregeh li wir ava kirine. Şaredariyên Kurdan li Bakur bi dest xistîn wan jî dagîr dike. Parlamenter jî di navê de bi dehhezaran Kurd di zindanan de ne. Ser 4 hezarî re gundên Kurdan hatin şewitandin. Ser 50 hezarî re Kurd hatin kuştin. Halbiku eger Emerîka û Ewropa li gorî pîvanên demokrasiyê hereket bikiran niha li Tirkiyê pirsgirêka kurdî ji zû ve hatibû çareserkirin. Eger dixwazin li Rojhilata Navî çareserî, aştî û aramî were, divê pirsgirêka Kurdan ku ji aliyê çar dewletan ve welatê wan hatiye parvekirin û her tim dibe qada operasyonên tinekirinê, weke çareserkirin. Eger Tirkiye bê sekinandin, pirsgirêka kurdî bi giştî bigirin dest, hem wê li Tirkiyê sîstemeke demokratîk bê avakirin, hem wê NATO ji serêşiyê rizgar bibe.